



# Erê, ez dixwazim bibim endam!

## 1. Agahiyên kesane

Erê, ez serlêdana xwe ji bo daxwaziya endambûna saziya AWO ya ciwanan dikim

Zayend:  Jin  Mêr  Wekî din .....(ji kerema xwe nîşan bikin)

Nav/Paşnav/Pîşe: .....

Kolan, Hejmara malê: ..... Hejmara posteya bajêr, cih: .....

Rojbûn: .....

E-Mail (gewünscht): ..... Telefon (gewünscht): .....

Ez wek endameke/î geşdarîya (refah) ji bo ciwanan, destûrnameya saziyê, rêberiya we û prensîbên wê nas dikim/dizanim (Li xala 5. binêrin). Endametî hetanî temenê 30 salî derbasdar e. Lê herdem mirov dikare bi nivîskî endametiya xwe betal bike.

**Erê, ezê bibim endamê AWO jî.**

Hûn bi prensîbên Geşdarîya Kar-AWO) dizanin (Agahî: [www.awo.org](http://www.awo.org) )

Min daneyên ji bo agahdariyên di derbarê parastinê de xwendin.

Ji bo kesên bîrnebir/nereşît: Destûra wasiyê zagonî. Ez destûrê didim.

Nav û paşnav

Kesên serbixwe, bi xwe dixwazin bibin endamê Saziya Ciwanan ya AWO

Mêjû/tarîx, destxet/îmzeya ya/yê dixwaze bibe endam

Mêjû û îmzeya wasî/berpirsiyarê zagonî

## 2. Mehanetî

Endametiya komela me ya ciwanan û ya AWO bê pere/belaş e.

## 3. Agahdariyê xebatên ciwanan.

**Ez dixwazim di derheqê xebatên ciwanan.de bi rêya postê û E-mailê agahdariyan bistînim.**

Agahdariyên di derheqê kampanyayên xwe de ji dildarê xwe bi E-mailê dişînin. Hûn kengî bixwazin, hûn dikarin ji listeya me ya E-mailan derên. Dawetiyên hilbijartinan bi gelemperî em bi postê dişînin.

#### **4. Li gorî xala 13 AB GDPR diyarkirina parastina daneyan**

AWO OWL e.V. saziya heremê ya ciwanan, wek endam ji bikaranîna daneyên we yê kesane berpirsiyar e.

##### **1. Bikaranîna daneyan (agahiyên kesî)**

- a) Dane yanî agahiyên di derbarê we de ji we tên girtin, ji bo kontrolkirinê û heger endametî çêbûbe, ji rêxistina/saziya ciwanan û heger hebe endametiya AWO ji bo armanca desteka rêveberiyê tên bikaranîn.
- b) Spartina zagonî ya bikaranîna daneyan li gorî xala AB GDPR Madde 6 (1) lit.b) AWO ya rêxistina ciwanan û endametiya we ya AWO bi xwe jî hebe ev peyman endamtiyê ye. Veşartina daneyên we li gorî zagona bazirganî û bacê li gorî xala AB GDPR 6 (1) (c) ye.
- c) Pêkanîna daneyên, ji bo rêxistina ciwanan û hebe endametiya AWO jî derbasdar e. Heger ev pêk neyê serlêdana endamtiyê nakeve meriyetê.
- d) Ji bo bikaranîna daneyan, li gorî xala AB GDPR 28 an di çarçoweya wek wesandina bikaranîna çalak ya pêkaneriya xizmetê tê bikaranîn.
- e) Dema ku hûn bûn endam, daneyên we ji aliyê me de wek Yekîtiya AWO ya Federal (navend û navnîşana rêveberiyê), Rêxistina Ciwanan ya Federal AWO e.V. yê berpirsiyariya heremê ya eyaletê, bajar, bajarok û ji berpirsiyariya heremê ya rêxistina ciwanan ya AWO re tê şandin. Ji bo endametiya we bê zelalkirin, di serlêdana endamtiyê de agahiyên kêr hebin û ji bo ew bîn sererastkirin, ji cihên hûn lê niştecih in, eyalet, bajar an bajarokên berpirsên xebatên ciwanan re dikare bîn şandin. Heger dane ne heremî û berpirsiyar bin, hate danhev û pê ve piştî salekê ev danê tên jêbirin ango paqijkirin.
- f) Wek beşeke ji endametiya we, daneyên kesane/şexsî tên komkirin, heta ku bi zagonî mafe me tunebe, an jî ger ku daneyên we ji bo berpirsiyariya bikaranîna tune be, dema endametî bi dawî bê tên paqijkirin. Daneyên bi rezervasonê re têkildar, piştî bidawîbûna endamtiyê deh salan şûn de tên paqijkirin.

##### **2. Agahiyên giştî yê mafê xwediya daneyan**

- a. Mafe we heye ku hûn di derbarê daneyên wê yê veşartî de hûn agahiyê ji me daxwaz bikin.
- b. Di daneyên we yê kesî/şexsî de şaşîti an kêmasî hebin, mafê we yê temamkirin û sererastkirinê heye.
- c. Heger hewcedariyên zagonî/qanûnî pêk werin, hûn dikarin sînoordarkirina bikaranîna daneyên daxwaz bikin an jî ji bo bikaranîna wan bi giştî (tevhî) îtiraz bikin.  
Ji aliyê zagonî de hetanî ku em ne neçar bin daneyên we bi kar bînin, her dema hûn bixwazin, hûn dikarin paqijkirina daneyên xwe daxwaz bikin.
- d. Di her rewşê de, dema daneyên we bîn paqijkirin, li gorî erka destûrnameyê divê endametiya we bê betalkirin.
- e. Bi şertê bandorê li maf û azadiya kesên din neke, mafê we heye ku daneyên we dane dikarin bîn veguheztin.
- f. Heger hûn bifikirin ku bikaranîna daneyên we derî rewşa zagonî tên îhlalkirin, hûn dikarin li ba saziyeke erkدارa venêrinê be, gilf bikin. (Mînak, komîseriya parastina daneyan ya eyaletê)

## 5. Rêgezên (prensîb) rêberî û destûrnameya rêxistina ciwanan

### 1. Rêgez

**1.1** Geşdariya Karkeran (Arbeiterwohlfahrt) rêxistina ciwanan, di çarçoweya destûrnameya demokratîk, serbixwe û xweser dixebite, komeleke zarok û ciwanan e. Avaniya wê bi zagonê tê destnîşankirin.

**1.2** Rêxistina ciwanan, wek beşeke tevgera karkeran û serkevtina wan girêdayî wê kevneşopiyê ye.

**1.3** Xebata Ciwanan (Jugendwerk), xwe li gorî rewşa xwe wek sazî/komela, ji biryardarên siyasî daxwazên xwe yên siyasî yên zarok û ciwanan dibîne. Rêxistina ciwanan ji aliyê siyasî û olî (dînî) de serbixwe ye.

**1.4** Saziya xebata ciwanan, ji aliyê ciwanên dildar de tê birêxistinandin û destnîşankirin.

**1.5** Endamê çalak yê komela rêxistina ciwanan, bi aweyekî demokratîk û di nava pêvajoya diyalogê de bi beşdariya hemû endaman pêşketina xwe nêrdeyam dike.

**1.6** Saziya xebata ciwanan, tevî rêxistina geşdariya karkeran, di aliyê ciavkî (sosyal) û polîtîk de di nava çalakiyan de cih digire. Mabesta komî ya rêxistina ciwanan, bi taybetî ji aliyê civakî de zarok, gihastî û ciwanên bêzavantaj e.

**1.7** Rêxistina xebata ciwanan, bi rêxistinên din yên ciwanan demokratîk re kar dike û bi komên ciwanan di her astê de komelên dişibîn hev tevî xebatên wan dibin.

**1.8** Rêxistina Ciwanan, ji HEMÛ ciwanên van rêgezan diparêzin re vekirî ye.

### 2. Nirx

Rêxistina ciwanan, di hemû çalakiyên xwe de, berî her tiştî girêdayî nirxên sosyalîzma demokratîk e: azadî, edalet, rizgarî, hevkarî, wekhevî û xweşbînî. Rêxistina ciwanan van nirxan li gorî hêjayiya mirovatiyê ya jiyane wek şertê bingehîn û pêşîn dibîne. Azadî, azadbûyin, edalet, hevkarî, wekhevî û xweşbînî bi hev ve girêdayî ne û mirov nikare van ji hev cuda bifikire. Herkes wekhev, kemilî û bê qisûr e. Ew ji aliyê rûmetê de wekî mirovên din wekhev e. Ji ber vê her mirov bihgehê kesayetiya xwe li gorî pêwistî û daxwazên xwe bi aweyekî serbixwe dikare pêş ve bibe. Di civakeke adil de, ev azadî hetanî azadiya kesên sînordar neke tê naskirin. Hevkarî, xweşbînî ji neçariya zagonî bêtir, bi çalakiyên pratîk hev parastin û di hemû qadên jiyana civakî li ser bingehê pêdiviyên de beşdarbûnê tê wateya parastinê.

Divê ev nirxên han li dijî xebatên ciwanan yên AWO neyên bikaranîn an nirxandin. Me hedefên xwe li gorî rizgarî, hevkarî, aborîzebûn û li dijî cudagirtinê (îzolasyon) destnîşan kirine.

### 3. Wêneyê mirov

Mirov mîna hebûneke civakî, kesayeta xwe di nava diyaloga kesên din de pêş ve dibin. Hemû nirx û baweriyên kesekî bi aweyekî xwezayî nayê dayin, divê bi kesên din re di nava vivakekê/komekê de pêş ve biçin. Ji bo di nava civakekê de serbixwe jiyane, pêwistiya mirovan bi vegotîneke wekhev heye. Di vê vegotinê de, xebata ciwanan, ji zarokan, bîrawiran û kesên gihastî, reşîtbûyin, azadbûn û behremendiya hevkarîyê hewce ye.

### 4. Armanc û daxwazî

Rêxistina ciwanan, îmajê xwe û pêkanîna nirxên xwe yên sosyalîzma demokratîk, di nava civakê de azadkirin, bi berpirsiyarî û çalakiyên hevkarî pêk tîne û tevî wê bi serkevtina şertên jiyane yên ji der ve tînan diyarkirin pêk tîne. Rêxistina ciwanan, xebatên xwe li ser têgihîştina hedefên xwe diyar dike. Li gorî wê jî Rêxistina ciwanan di ajandaya xwe de van daxwazan dike:

- Ji bo parvekirina dewlemendiya civakî, li şûna serkevtina edaletê, pêwistî bi pêdiviya edaletê heye.
- Ji bo zayendiya civakî, bi lêkolîneke rexnegirî di nava civatê de rola zayendî (cinsî) û di vî warî çareserkirina bêedaletiyê.
- Hemû aweyên perwerdeyê li ser bingeha rêgeza mafê çaranûsa xwe diyarkirin û bi kirina aweyê diyalogî.
- Ji bo mafê herkes karibe ji bo xwe tevî qadên jiyane bibe.
- Di nava hevkarîya ciwanan de, bi aweyê civakî fikirin û tevgerin, ji bo tevlêbûna çareserîya erkên sosyal û polîtîk divê ciwan bînan teşwîqkirin û piştgiriya wan bê kirin.
- Divê derfetê ciwanan yên lidijderketina di nava civakê de li hemberî helwestên ne demokratîk bê pêkanîn.
- Rêxistina ciwanan, di nava komelê û civakê de li dijî hemû babetên cudakariyê hewl dide.

### 5. Erk/peywir

Navenda xebata ciwanan, zarok, bîrawir û komên ciwanên gihastî ye. Wek nûnerê berjewendiyên wan, xebata ciwanan ji bo tevlêbûna hemû ciwanan ya civakê ji xwe re kiriye erk. Ajandaya ciwanan vê erkê bi aweyekî çalak ji bo pêşketina ciwanan derî mufredatê perwerdeya ciwanan û ji bo teşwîqkirina qadên jiyane diafirîne û pêk tîne. Bi vê boneyê rêxistina ciwanan demokratîk, bi diyalog, perwerde û pêvajoyên biryardayinê derfetan pêk tîne. Xebata ciwanan (Jugendwerk) di xebatên zarok, bîrawir û ciwanên gihastî de di naxa nirxdarî û xebatên bi komî de ji biryardarên polîtîk tevî daxwazên xwe bi çalakiyên navxweyî û derî xwe bi aweyekî çalak nûnertiye dike û helwest û pozîsyonê pêş dixwe.